



# QENGE YEKITIYE

KOVARA YEKITIYA DEMOKRATÊN KURDISTAN

ZEITSCHRIFT DER UNION DER DEMOKRATEN KURDISTANS



IDRÎS BARZANÎ

1944-31.1.1987

Endamê Mekteba Siyasî KDP

JÎ BO SERXWEBÛNÊ DÎ ENIYEK NIŞTIMANÎ DE BÎGHÊN HEV !

Sal:5/1987

Hêjmar: 9

Biha: 3,- DM

Hezar, hezar sed sal herin

Merd û namerd ser bigerin

Te bernadin em ji destan

Welatê me xeş Kurdistan

# T Ê D A Y Î

| <u>N i v î s k a r</u>  | <u>N i v î s a r</u>    | <u>R û p e l</u> |
|---|-------------------------|------------------|
| Newroz,divê bi serfirazî ...<br>û şadimanî were pîrozkirin      | Hemreş Reşo             | 1                |
| Derxistina Çelê Kek Îdrîs ..<br>Barzanî                         | Bi navê 5<br>Rêxistinan | 4                |
| Spas .....  | H.Reşo                  | 6                |
| Bo Kovara Dengê YDK .....                                       | Bênav                   | 7                |
| Ji jiyana Kurdên Komara.....<br>Sovyetîstinê                    | Têmurê Xelîl            | 12               |
| Şaşiyek Mezin.....  | H.Reşo                  | 14               |
| Axaftinek bi navê yekitiya .....                                |                         | 15               |
| Hêz û Tevgerê   |                         |                  |
| Rêzannameya Koma Doliwger.. .....                               |                         | 17               |
| Biryarên Komcivînê .....  |                         | 20               |
| Hin nameyên Xwendevanan.....                                    |                         | 25-26            |
| Der Richter und der .....                                       | Şahin Baker             | 27               |
| kurdische Bauer   |                         |                  |
| Weit weg von Kurdistan.....                                     | Rizgar Heval            | 29               |
| Brief des Revolutionsführers<br>Oberst Muammer Al Gaddafi ..... |                         | 30               |
| Presseerklärung   |                         | 31               |

Navnîşan  
Anschrift

YDK (UDK)  
P.F.103041  
4650 Gelsenkirchen

NEWROZ, DÎVÊ BÎ SERFÎRAZÎ Û  
ŞADÎMANÎ WERE PÎROZKIRÎN !

Ev bûn 2599 sal in ku gelê Kurd tevî gelên îranî her-  
sal di 21. Avdarê de roja serketina dijzînatî û dijme-  
tinkariyê bi serbilindî pîroz dikin. Jiber ku navero-  
ka vê rojê tevger û şoreşan di xwe de vedişêre û bi  
xwebêja "Roja Nû" hatiye navkirin, karbidestên zordar  
bi hemû hêz û desthatiyên xwe dijî pîrozkirina vê ro-  
ja giranbiha radiwestin û pîrozkirina wê jî qedexe di-  
kin. Newrozek tunne ye ku şoreşger û mêrxasên Kurd tê-  
de, bi destên neyaran nehatine êşandin, girtin û kuş-  
tin! Lê ew mêrxasana her bi leheng û cangoriyên Kurd-  
istanê dihatin navandin, dibûn serbilindiya gelê Kurd  
û welatparêzî jî bi wan dihate vejandin...

Gellekî mixabin ku îsal, piştî 2599 salan, xwûna xor-  
tên Kurd, bi destên Kurd hate rijandin! Dest Kurd e,  
lê, bê guman, giyan û mêjiyê ku vê kiritiyê dide ki-  
rin ne Kurd e! Jiber ku ev kirina kambax tenê ji bo  
berjewendiya neyaran e...

Ji bo me her xebatek, her livînek û her tevgereke Kur-  
distanî parçeyek ji xebata serxwebûna Kurdistan e û  
ev li nik me xebateke gellekî giranbiha ye. Çawa be jî  
livînek e û berve pêş e. Gava em razana mîlyonan kes  
an jî dijberiya bi hezaran caş, ku bûne destbirakê ne-  
yaran, bînin ber çavan, divê em bêtir piştgîriya van  
xebat û têkoşînên renga reng bikin, ne ku dijî wan ra-  
westin û bibin kelemê ber lingên wan! Mafê me nîne ku

em ligor dilê xwe, an jî ligor desthatî û hêza xwe tevgerên din bi başî an jî bi kirêtî bidin naskirin û dijberiya wan bikin. Dijberî, kefteleft û berhev-danên raman û bîrûbaweriyên testekî xweristî ye û divê were kirin. Ev rexnekarî divê avadar be, ne mal-kambax be. Xebata gelê Kurd bi hezaran sal her dom-dar e û kesek nikare sedî sed bibêje ka dê hîn çend salên din jî dom bike. Jiyanê gelan nikare bi teme-na merovan were pîvandin. Kesên gel, an jî têkoşerên gelan dimirin, lê gel bi milyonan sal dijîn! Jiyanê gelan, jiyaneke herhe ye. Bê tewatî (sebir) di xebata gelan de her dibe sedema kambaxî û şikestina wan. Bi karên lez û bezî ta niha ne kesek û ne jî gelek gîhayê serdestî û serfiraziyê. Her zû mandî bûne û li paş mane... Lê divê têkoşer û welatparêzên gelên bindest her roj û her bîstekê amadeyî serdestiyê bin, keys di xebata rêzanî de gellekî giring û zîz e, divê, di demê de dest were avêtinê...

Keysa ku di vê demê de ketiye destên gelê Kurd, tuçaran nehatiye dîtin. Em dikarin bibêjin, ev keysa îro di dema Cenga Cîhanî ya yekemîn de jî tunnebû:

Rast e, di wê demê de, di hevhatina Sevrê de mafê gelê Kurd hatibû naskirin, lê hawêrdora Kurdistanê di bin lepên emperyalîstan de bû. Di wê demê de berjewendîya Yekitiya Sovyêt ligel cenga serxwebûna Kemalîstan, paraztina sînorên xwe yê nivroyî dijî emperyalîstan û ya giringtir têkuzkirina hîmavêtina Şoreşa Okteber bû..

Bi hevhatinên Sadabad, Baxdad û CENTO girêdanine bi hêz di navbera mêtîngehkarên gelê Kurd de pêkhatibûn û bi sazkirina NATO jî zordarên me bêtir bi hêz bû bûn. Bi kurtî, ta roja îro guhêrtina sînorên Rohelata-Navîn ne ligor berjewendiya hêzên gewre bû.

Piştî derketina Îraq ji Pakta-Baxdad (1958) û bi helweşandina nîrê Şahînsahî Pakta-CENTO jî linav rabû! Di vir de eşkere ye ku êdî hevhatinî Kurdkuj, ên bi piştgîriya emperyalîstan, di navbera zordarên Kurdistan de nemane. Bi vacayî, ev bûn heft sal in ku du zordarên me hevûdin re dicengin û berxwedana mirin û mayîne didine. Di aliyê din de jî bi mêraniya Gorbaçof têkoşîna anîna aşitiyê û linavrakirina çekên atomî destpêkiriye. Bi serketina vê têkoşînê, dê hêrgiz û bêguman metirsiya cengên di navbera hêzên gewre de jî kêmbike, wan nêzîkî hev bike û ya giringtir dê guhartinek jî têkeve rêzaniya stratecî! Xwebêja vê ew e ku êdî karbidestên Turkiyê, dê nikaribin, wek berê, tenê jiber ciyê xwe yê stratecî û bi endambûna NATO piştî xwe bidin emperyalîstan...

Belê, di roja îroyîn de ku rêxistinên Kurdistanî kefteleft û têkoşîna hevnezişkûn û yekdestiyê didin, di vê her kes û her rêxistin zîzbûna vê xebata giranbiha bidin ber çavan û ligor wê jî bilivin û bixebitin. Ger na, ewana bixwazin an nexwazin dikevin bin bandora neyaran û dibin dijberên vê hêrikîna havildar ku gelê Kurd îro ji hemû rojan bêtir hewce ye..

Hemreş Reşo

Em bawer in ku ev axaftina jêrin ku bi navê pênc parti-  
yên Kurdistanî hatiye pêşkeskirin ji gellek gotarên tay-  
betî bêtir desthelatî,berpirsiyarî û fedekariyên kek Îd-  
ris di xebata gelê Kurd de dide ber çavan. Tevî pêşkes-  
kirina vê axaftinê em serxweşiya xwendevanên xwe jî di-  
xwazin..

DERXISTINA ÇELÊ KEK ÎDRÎS BARZANÎ (---.---.1944-31.1.1987)

Mêvanên birêz,

Xûçk û brayên hêja!

Em îro bi giyanekî bratî şîna Leheng û Cangoriyê Kurdis-  
tanê Kek Îdris Barzanî dikine û Çelê Wî derdêxine. Bê gu-  
man li hawêrdora Kurdistanê jî îro ev roja reş teye çê-  
kirin û gellek lava û daxwazên dilovanî û mihrevaniyê li  
giyanê Wî têne barandin û bi mîlyonan Kurd xengînî û da-  
xwazên serxweşiyê pêşkesî malbata Wî û PDK-Îraqê dikine.

Ez jî bi navê PDK-RN (Partiya Demokratî Kurdistan-Rêxis-  
tina Neteweyî), PGK (Partiya Gelê Kurdistan), PPKK (Par-  
tiya Pêşenga Karkerên Kurdistan), ŞK (Şoreşgerên Kurdis-  
tan) û bi navê YSK (Yekitiya Sosyalîstên Kurdistan) daxwa-  
za serxweşiyê pêşkesî we, malbata Wî û PDK-Îraqê dikim.  
Mêvanên birêz,

Heval û hogirên giranbiha!

Tête gotin ku "ew kesê xebat û têkoşînê dijî zînatkarî  
û bindestiyê bajo û bike, bi dirêjiya vê xebat û têkoşî-  
na xwe merovekî serbixwe û azad e". Bê guman em dikarin  
bibêjin ku Cangoriyê me Kek Îdris bi dirêjiya jiyana xwe

her serbixwe û azad bû.

Jiber ku Ew jî wek bavê xwe, Pêşengê nemir M. Mustafa Barzanî, di zarokiya xwe de ketibû nav kada xebat û têkoşîna serxwebûna gelê Kurd. Ew di yeksaliya xwe de, di sala 1945 de beşdarî Şoreşa Barzan bû. Wî ta sêşaliya xwe bêhna azadî û serxwebûna Komara Mahabad jî kişand. Ta çardehsaliya xwe li nivroyê Îraqê dîrxistiyê nîrê karbidestên zordar û mêtîngehkarên Bexdadê bû. Ji sala 1961 ta roja dilrawestîne, Wî dev ji kefteleft, xebat û têkoşîna gelê xwe berneda!

Ma gelo ev jiyana serfiraz û bi rûmet a 43 salan bûye para kê?

Wek dîrok û bi taybetî jî serpêhatiyên gelê Kurd didin zanîn ku gellek kêr keç û lawên têkoşerên mezin hene ku dikarin bi mîranî bidin ser reya bavên xwe, an jî ciyê wan bikarin bigrin..

Ka zarokên Şêx Seîdê Kal? Ka zarokên Seyîd Riza û Şêx Mahmud?..

Di dîroka cîhanê de ta niha nehatiye nivisîn ku piştî şikestina şoreşan, Pêşeng û Rêberên wan kanîne careke din bibin Serok, Pêşeng û Rêberên şoreşên nûjen! Herçend ku gellek caran keysa jiyanê xwe û bilind ketibû destên M. Mustafa Barzanî û zarokên Wî jî, wan dev ji gelê xwe bernedan û herdem di jiyana gelê xwe de beşdar bûn...

Ne Bircên li Waşington û Moskow û ne jî Qesra Nûrî Seîd li Bexdadê kanî wan ji gelê wan bide dîrxistin! Dilê wan herdem ligel gel bû û di nav gelê xwe de diman, ligel Pêşmergeyê Leheng jî dilê Kek Îdrîs rawestiya.. Yezdanê

mezin lê dilovan be!

Her bijî bîranîna Kek İdris!

Her bijî şoreşa serxwebûna Kurdistan!

Bonn, Roja 8.03.1987

---

---

SIPAS!

GELLEKÎ MIXABÎN KU PAR DÎ 3.5.1986 DE BAVÊ ME JÎ ÇŪ  
DÎLOVANIYA XWEDÊ Ū ME HERSÊ BRAN JÎ NIKARÎBŪN DARÊ  
WÎ HELGÎRÎN SER MÎLÊN XWE!''''. EM LI VIR XWESPARTE Ū  
EW JÎ LI WÎR DÎ NAV AXA SAR DE!  
JÎBER KU GELLEK BRA, HEVAL Ū HOGÎR BÎ BRŪSKAN, NAMEYAN,  
DŪRBÎSTKAN Ū BÎ SERLÊDANA ME DÎ XEMGÎNÎ Ū ŞÎNA ME DE  
BEŞDAR BŪN, DERENG BE JÎ, EM DIXWAZÎN BÎ DÎL Ū GIYAN  
SIPASÎ WAN BIKÎN,.....

Bi navê malbatê

Hemreş Reşo

---

---



Gotarek kin li ser "axe", "bûrciwazî" û "devrimci"  
yên Kurd

Gelê me salên dirêj di şevreşiyek bê hempa de jiyana xwe domandiye. Rojek ji rojan hatiye ku fersend ketiye dest hejmarek biçûk ji me, ku em çend gotaran, an pirtûk û nîvekê li ser şoreşa Oktober ya gewre bixwînin, ew jî di quncikên xaniyan de, bi dizî û di bin çirayên melûl de. Em weqa aşiqî serketina wê şoreşê bûne, ku em ketine xewn û xeyalan û piran ji me wisa texmîn kirine ku Kurdistana me jî di gengaziyên Rûsistanê yên sala 1917 an de ye. Di demek kuli hemû beşên Kurdistanê hê 10 kargeh tunebûn, me dest pê kir em li ser prolêtarya bi babetek romantîkî bipeyivin, me dest pê kir em navên wek "bûrciwazî" li halorteyên gelê xwe kin û me wer dizanibû (hê gelek ji me di wê xewnê de ne) ku rojek ê di salên li pêş de were û emê ala sor rakin û ne tenê ê Kurd ji hemî quncikên welêt wek mûriyan der bin bo di bin siya ala sor de bimeşin, lêbelê ê bi sedhezaran, na bi mîlyonan, karkerên Ereb û Tirk û Faris jî werin û milan bidin milên me. Bi rastî merov ji ber xwe ve şerm dike ku hê hin kukimên me di van xewn û xeyalan de dijîn. Derdê mezin ew e ku, dema merov dest bi gotina şora rast û objektîv dike, tîpên wisa hema tûrikên xwe vedikin û navên babet babet li merovan dikin. Hinan ji me serên xwe, wek hin babetên teyran, kirine qûmê ye û naxwazin hebûna rewşê ya rast

bibînin. Hezar car mixabin ku pirr ji mirovên welatparêz hene ku xwe ji derdê van tîpên me yên bexteres di paş perdeyan de veşartine, çiku ew ditirsin kes navên wek "bûrciwa", "axa", û h.d. li wan ke. Di çend salên buhirîn de em di hin deman re derbas bûn ku êdî niştimanperwerî bi xwe jî bû "kufir û îlhad". Pirr caran navên Şêx Seîdê gewre, Qazî Muhammed û Kurdperwerên wek Barzanî hema hindik mabû ku ji hêla hin "devrimciyên" me de werin qedexe kirin. Lê waye hêdî hêdî em bi xwe dihesine. Ne veşartiyê ku mirovên Kurdperwer û niştimanperwer roj bi roj pirtir dibine û bê tirs û şerm li neteweya xwe xwedî derdikevine. Xwaztina Kurdistanek yekbûyî û serbixwe nuha bûye daxwaza piraniya endamên neteweya Kurd e, bi taybetî şoresgêrên Kurd.

Ez dixwazim ji hin hevalên "devrimciyên cîhanperwer" (ez dixwazim li vir bidim zanîn ku ez ê xwe qurbana yeketiya gelên cîhanê kim, ango ez ne li dijî yeketiya gelan im. Tenê pêwîst e ku merov rewşa li holê û xewn û xeyalan ji hev derxe. Çi sûd ê bigihê me dema em bi şev û roj biqîrin: Karkerên cîhanê bi yek bin, dema ku karkerên welatên wek Aleman, Austirya, Danimark û h.d. li me vegeirînin û bibêjin: siktir, herin welatên xwe!) bibipirsim:

- a) Çend mîlyonêr (yên Kurd) li Kurdistanê hene?
- b) Çend kargehên Kurdan yên mezin hene?

Bi rastî me ji xwe re di xewn û xeyalan de "dijminên Kurd yên serdest" anîne ber çavan e.

Erê, nayê veşartin ku hin axayên serdest hebûne û he-  
ne, lê ewên civaka Kurd û Kurdistanê baş dinasin, ê  
bizanibin ku li welatê mi pirr daran malên xwedî peya  
(malbatên ku hejmara mêran têde mezin e) yên ku xwe-  
dî pere û zevî ne serdestiyek bê hempa li ewên dirdo-  
ra xwe kirine, ango belengazan zordarî li belengazan  
"endamên çîna xwe) kirine û dikin. Di rewşek feûdal  
de serokê eşîrekê dikare bo endamek eşîra xwe, çîqa be-  
lengaz be jî, serokê eşîrek din bikuje. Bi peyvên din,  
sedema hebûna serdestiya Kurdan bi xwe, bêtir paşve-  
mayîn û nezantî ye û ne çînî. Hebûna hukmatek niştiman-  
perwer û zana ê bikaribe di demek kurt de dawiyê bide  
van nexweşîyan.

Bi bîrûbaweriya min, merovê Kurd di feûdaliya xwe de  
jî sosyalîst e (ne bi hawak ilmî). Ew ji erf û edetên  
Kurdan in ku ew xwarina xwe, xaniyên xwe û hebûna xwe  
bi endamên malbata xwe re û mêvanan re parvekin, dest  
bidin meriyên xwe û bi ewên dorhêlên xwe re bikenin û  
bigrîn. Wisa sîstêmek sosyalîst ê bê guman ji hêla pi-  
raniya gelê me de were pejirandin, û ger Kurdistanek  
serbixwe were holê ew ê Kurdistanek sosyalîst be, lê  
hêvî ew e ku di Kurdistana me ya sosyalîst de şahî, de-  
mokrasi, merovtî û hezkirina gel bibin amanc. Çawa ku  
Kurdistanek wek Binanê û Bengala Dêş bo me navên, wisa  
Kurdistanek wek Kambodya ya Pol Pot jî bo me navê. Divê  
em ji xwe bîra nekin ku kirasê li Heso dibe belkî li  
Miso nebe. Bi peyvên din, merovê baqil divê tucaran ji  
xwe bîra neke, gelê Kurdistanê ne gelê Kûba ye û gelê

Kûba ne gelê Swêd e. Gelek di demên dûr û dirêj re, di rewşên babet babet re derbas dibe, erf û edetan tîne holê, bawerîya hêvan dike. Ne ji mafên kesî ye, bi taybetî ne ji mafên "devrimciyên Kurde" ku ew li bajarên Ewropa biryarê bidin, ka gelê me çi dixwaze (erê, erê, Lenîn jî li derve bû, lêbelê carek din ez dibêjim: Lenîn Lenîn bû, Rûsistan Rûsistan bû û sala 1917an demek din bû).

Em carek din werin ser axayên Kurd. Îroj li hin beşên Kurdistanê êdî beg û axa neman e. Li hin beşan jî hema navê axa li her kesî dibe, yê ku 15-20 şunbil zeviyên xwe hene. Hebûn û pereyên piraniya axayên Kurdistanê nikarin ji xwe diyê xwe re bibin nêrxê kirîna trîmbêlek Mercedes. Li milê din dema şoreşa neteweya Kurd di bin ala yekitiyê de cîh bigre û agirê wê gurr bibe, ê kîjan axa bikaribe li bav û dayên cotkar û rêncberan tadê bike?! Bê guman ji sedî nod ji "axayên" Kurdistanê ê amade bin xwe û hebûna xwe bo Kurdistanek rizgar pêşkeş bikin. Belkê ji sedî deh bo sûda xwe ya aborî birevin welatên din. Ez şaşitiyek mezin dibînim, dema hin ji "devrimciyên" me axayên Kurdistanê wek dîwarek mezin dibînin û wer dizanin ku hebûna wan tenê bûye sedema bindestbûna gelê Kurd. Ger serokên serhildanên Kurdan yê destpêke sedsala 20an axa û şêx bûn, ma gelo serokên şoreşa gelê Ereb dî 1918an kî bûn? Êdî bes e lo!! Wek bav û kalên me digotin: "Gor bera xwe lingên xwe dirêj ke." Sosyâlîzm, karkerên cîhanê û şoreşgêrên cîhanê jî li ser ser-û çavan, lê bona xatirê Kawa, werin em xwe ji nav mijê

derxin û li ber çavan bibînin ku:

- a) Dem ne destpêka sedsala 20an e, lê dawiya wê ye,
- b) Şûn ne Rûsistan û ne jî Kûba û ne jî Vietnam e, lê Kurdistanê ji hev hatî çirrandin e,
- c) Gel ne gelek Ewropî ye û ne jî bi hezaran Kurd di kargehên welêt de bi deh salan hatine organîze kirin, lêbelê gelê Kurd yê bê dost û heval e ku ji o/o 90 û bêtir ji endamên wî hê nizanin rojnameyekê bixwînin.

Ger em bi kûranî û bi ferehî di rewşa gel û welatê xwe de bifikirin û rewşa navneteweyî baş bidin ber çavan tu guman namîne ku têkoşîna gelê Kurd ber her tiştî têkoşînek neteweyî ye û tenê hevgerî û yekitiya gelê Kurd di bin ala rizgarî û yekitiya Kurdistanê de ê bikaribin vî gelê bigihînin amancên wî. Ew bêhişbûn e ger em ji teoriya Marksîzmê û ji têkoşînên gelên din sîdê nebînin, lê pêwîst e ku ew goreyî rewş û doza Kurd û Kurdistanê têkevin kar û xebatê, ne ku em wan bi zor li gel feriz bikin.

---

---

Ji Jiyana Kurdên Komarên  
Sovyetîstanê  
Rûspîtiya Gelê Xwe

Di welatê me de navê "Dersdarê Emekdar" didine wan dersdaran, kîjana salêd dirêj bi helalî şuxulê hînkirin û terbetkirina şagirta û xwendekaran ve mijûl bûne, zanebûnêd wan dane dewlemendkirinê, bona malhebûna cimetiyê kadroyên merîfet hazir kirine, nava wan de wetenhizî, xebathizî, paqijayî terbet kirine.

Ji Kurdê Sovyetê hetanî niha hêjayî wî navî bûne Şehîd Muradov û Cewoyê Memo ji Ermenîstanê, Enberê Kerem ji Qazaxîstinê, Baxço û Ezîzê Îsko ji Gurcîstanê û yêd mayîn.

Îro bineciyê bajarê Tbilîsê, serekê xwendegeha navbenda navça Sîrandûantkariyêyê malhebûna gundîtiyê (li Gurcîstanê) Îşxanê Celîl Mûradov jî hêjayî vî navê herî bilind bûye dereca dersdariyê de. Bi wê yeke ve wî navê gelê xwe bilind kir.

Nava 30 salêd xweyê xebata dersdariyê de wî bi sedan kadro hazir kirine bona malhebûna gundîtiyê. Kutakiriyêd vê îdara xwendinê-zoteknîk, agronom, beytar û yêd mayîn niha cî û wargêd welatê me yê cihê-cihê de bi serfirazî dixebitin.

Îşxanê Celîl jiyaneke hewaskar derbaz kiriye, jiber ku wek ew dibêje, xebata wî bi dilê wî ye û jê lezetê dibîne. Ew her xwendekarekî re, çawa dibêjin, bi zimanekî xeber dide, bi dilovanî berbirî her yekî dibe, çimkî gelek cahila bi xebata dersdar re girêdayî ye.

Partiya Komunîst û hukumeta Sovyetê emekê Îşxanê Celîl

Mûradov bilind qîmet kirine û navê "Dersdarê Gurcistinê yê emekdar" dane wî, lê berî wê ew hêjayî mêdala "Vêtêranê xebatê" bû bû.

Lê gelo ew çawa gihêştiye vê derecê?

Îşxanê Celîl sala 1930, li gundê Karvansarê, navçeya Aragasê ji diya xwe bûye. Zarotiya wî li vî gundê Kurdan de derbaz bûye, ji ku mirovên usa ye bi nav û deng derketine, wek doktor Xalitê Mirad Çetoyêv, nivîskar Xelîlê Çaçan Mûradov (apê Îşxan), dewsgirtiyê şewra komîteya navçeyê Aragasê ye şuxulkirinê Bekirê Xalit, serhing Bayloz Razgo-yêv. Navê wî gundî niha Emrê teze ye. Gava ew 9 salî bû, mala wana cîgzastî bajarê Tbilîsê dibe, li ku Îşxan dibistana navîn temam dike. Peyra ew li Yêrêvanê, înstûtûta mamostahazirkirinê yê dewletê ser navê X. Abovyanda dixwîne û weya xilaz dike. Paşî kutakirinêra navça Araratê, gundê Vêdiyê de du salan dersdarî kiriye û dîsa çûye Tbilîsê û bi cûrê dûreke fakûltêta zimanzaniyê ya înstûtûta Tbilîsê ya pêdagogiyê yê dewletê ser navê Pûşkîn xilaz dike. Endamê Partiya Yekitiya Sovyêtê ya Komunîst Îşxanê Celîl maleke usada mezin bûye, li kîderê qedrê xwendinê zanibûne. Bavê wî Celîlê Çaçan Mûradov, weke 50 salan pêşda xwendina bilind dest aniyê, ser qulixê cabdarda xebitiye, miqalledarê rojname "Rya Teze" û radyoya kurdî bûye. Xûska Îşxan-Zînê, ji jinêd Kurd yeke pêşîn bû ku pêşekê îjênêriyê dest anî. Keça Îşxan-Leylê, înstûtûtiya Tbilîsê ya pêdagogiyê zimanêd rûsî û welatêd dereke xilaz kiriye, endama şewra aliyê xebata tevî cahilêd Kurd e, ku rex komîteya paytextê Gurcistanê yê komsomola şuxul dike.

Her cara, gava Îşxanê Celîl derê dersxanê vedike û dest bi dersa ziman û lîteretûra rûsî dike, dîcedîne temamiya dersê bi kardarî bide xebatê, her dereceke têma rojê bigihîne fêdariya xwendekaran, û ew yek wîra li hev tê. Lema jî xwendekar usa guhdar dersêd wî dibihên û nava zanebûnada kûr dibin.

Têmurê Xelîl

Endamê Yekitiya Rojnamevanêd Sov-  
tîstanê

---

### ŞAŞIYEK MEZÎN!

#### KEREMA XWE ME BÎBORÎN!

Me li ser gotina hevalekî ku li Sovyetîstanê xwendina bilind kiribû, navê H.Cindî jî di hejmarê 7/8 de mamostayê giranbiha yê ku miribûn nivisîbû. Em li ser agadariya brayê me yê hêja Têmurê Xelîl bi vê şaşiya xwe hesiyar. Em gellekî spasî T.Xelîl dikin ku ew şaşiya me da ber çavan û em gellekî spasdarê Yêdanê mezin' in ku mamostayê giranbiha û hêja wek heval T.Xelîl dibêje "Ew sax e û karekî baş jî dike". Bi hêviya ku salên pêş me de di xweşiyê de bijî û em serketin, serbilindî û serfiraziya wî dixwazin. Bi hêviya ku ew û xwendevanên me li me biborin!

Hemrêş Reşo



Doz û daxwaza rêxistina me hêdî hêdî teye cî!!!  
Di destpêka YEKÎTIYA HÊZ Û TEVGERÊ de axaftinek.

Di Newroza KKDK de..

Köln, roja 21.03.1987

Mêvanên birêz,

Heval û hogirên hêja!

Em bi navê Partiya Demokratî Kurdistan- Rêxistina Nete-  
weyî (PDK-RN), Partiya Gelê Kurdistan (PGK), Partiya Pê-  
şenga Karkerên Kurdistan (PPKK), Şoresgerên Kurdistan  
(ŞK) û Yekitiya Sosyalîstên Kurdistan (YSK) Newroza we  
bi dil û giyan pîroz dikin. Jiber ku Newroz di dîroka  
Kurdistanê de xwedî ciyekî gellekî taybetî û bilind e,  
em giringiyek mezin didin vê şeva neteweyî û serketina  
şeva we dixwazin.

Cejna Newroz, cejna neteweyî li gelê me, li herçar par-  
çe Kurdistan pîroz be!

Wek tête zanîn, berî 2599 salan gelê me jî di bin pêşen-  
giya mêrxasê leheng Hesinkar KAWA de zordariya Dehakê  
zînatkar helweşand û gîha rizgariya xwe. Ev roja 21. Av-  
darê bû. Ev roja di nav gelê me de bi xwebêja "Roja Nû"  
Newroz hate binavkirin û ji wê demê vir de ta roja îro  
gelê Kurd hersal bi şadimaniyên mezin bîranîna vê rojê  
pîroz dike.

Îro dîsa gelê me bi destên mêtîngehkar teye pelçiqan-  
din, şêlandin û êşandin. Herçend ku cejna neteweyî New-  
roz hatiye qedexekirin û mêtîngehkar hewldidin hemû re-  
yan lê bigrin jî, gelê me di bin metirsiyên renga reng

de, di 21. Avdarê de li hawêrdora Kurdistanê vê roja dij-  
mêtingehkarî û dijnijadperestiyê bi vêxistina agiran li  
ser çiyayên Kurdistanê pîroz dike û jê xwedî derdikeve.

Ne zînatkariya mêtingehkaran û ne jî hovberiyên wan dê  
bikaribin pîrozkirina vê rojê, ku ji bo gelê me bûye nî-  
şana azadî û serxwebûnê, rawestînin.

Rojên pêşende dê her bibin rojên azadî û serxwebûna ge-  
lê me û dê bibin rojên ketin û wendabûna mêtingehkar û  
zordaran.

Em di vê roja bi nav û deng û sergevaz de destên hevka-  
rî û bratiyê dirêjî hemû welatparêz, demokrat, şoreşger  
û sosyalîstan dikin.

Yekitiyên domdar û hêzdar di navbera hemû hêzên ku bawe-  
riya xwe bi azadî û serxwebûna gelê Kurd hene pêwîst in.

Rawestandina êrişên neyarên hov û har, helweşandina nîrê  
mêtingehkariyê tenê bi hevgiirtin û yekitiya hemû hêzên  
Kurdistanî dikare were cî.

Yekitiya me "Yekitiya Hêz û Tevgerê", dê hêrgiz serxwe-  
bûna gelê me û helweşandin û wendakirina mêtingehkar û  
zordaran nêzîk bike.

Ji bo pîrozkirina Newrozan di Kurdistanê serbixwe de we-  
rin em yekdest û pî li pî dijî neyaran rawestin!

Bijî Newroz!

---

RÊZANNAMEYA KOMA DOLÎWGER JÎ BO KOMCIVÎNA HEFTAN  
A YEKÎTIYA DEMOKRATÊN KURDISTAN, ROJA 1.10.1986

Mêvanên birêz!

Hevalên hêja !

Em bi bratî xêrhatina we dikin...

Wek hûn jî dizanin û dibînin Komcivîna me ya salî îsal jî mehekê bi derengî ket! Ev derengketin ne ji ber kêmtirxemî û sistiya me ye, bi vacayî ev nîşana firehbûna kada xebatê ye. Her sal bar girantir, xebata netewî bêtir û zordariya mêtinkaran jî hovtir dibê...

Di destpêkê de divyabû em bi tenê serê xwe, ligor amancên rêxistina xwe bixebitin, girêdan û beroirsiyariyên me ligel rêxistinên Kurd û Kurdistanî kêmbûn. Ligor armanc û doza me divyabû ev girêdanana pêkbihatana û pêkhatin jî. Îro kêmbûna rêxistin hene ku hevkarî û dostaniya me ligel wan tunnebe! Ev dibe ûsta gellek kar û barên derî rêxistina me. Lê kar û barên hevkarî, tevkarî û netewî..

Gava em dibêjin xebata netewî bêtir bû ye, xwebêja vê ew e ku berxwedan û têkoşîna gel û rêxistinên Kurdistanî gurtir dibê, bêtir teye vejandin û dengê çekdar û rêzaniya Kurdistan dikarê xwe bighîne gelên cîhanê. Êdî kes nikarê bi sînoran, bi destdana ser nûçeguhêziyê perdeyek tarî bavêje ser gelê Kurd û welatê wî Kurdistan. Her livînek, her bûyerek li Kurdistan û li Rojhelata-Navîn dikarê li derveyî welêt deng bide, were zanîn û nasîn.. Di aliyê din de, herçend ku di navbera têkoşerên

Kurdistan de girêdan û hevkarîyeke ku dildixwaze pêkne-  
hatiye jî, pîrraniya rêxistin û çekdaran dev ji dijbe-  
riya hevûdin berdane, berê çek û hêzên xwe dane dijmin.  
Hêdî hêdî armanca ewtonomîxwazî jî ji giringiya xwe wen-  
da dikê, cîyê xwe ji doza "mafên çarenûsî"re berdidê..  
Jiber ku doz û daxwaza Ewtonomiyê rê dide rêzaniya par-  
çe, an jî navçeparêziyê, her weha rê dide mêtinkarên  
parçeyên din jî ku şoreşên Kurd ji bo berjewendiya xwe  
bikarbihênin. Ev girêdana jî çewtî û boblatek mezin di  
xwe de vedişêre. Tucaran mêtinkarên Kurdistan nebûne  
dilxwaz, dilsoz û piştgîrên parçekurdistanên din û na-  
bin jî. Ewê ku brayên min bikuje, wan bişêlîne çawa di-  
kare bibe dost, heval û piştgîrê min! Jiber vê yekê û  
gellekên din jî dev ji doza Ewtonomiyê berdan rê li dest-  
dirêjîya mêtinkaran digre û rêzaniya Kurdistan ji nav  
çarçeweya Rojhelata-Navîn derdikeve, dibe rêzaniyeke  
navnetewî.. Dostanî, hevalbendî û piştgîriya gel û aza-  
dixwazên cîhanê dibe rêzaniya rojane ku pîrsa serxwebû-  
na gelê Kurd dikeve nav bernamêcên civîn, Komcivîn, dan-  
ûstandin û tevgerên navnetewî!

Ev e doz û daxwaza gelê Kurd û ev e doz û daxwaza Pêş-  
mergeyên Kurdistan!...

Mêyanên birêz!

Hevalên dilsoz û giranbiha!

Wek hûn jî dizanin û dibînin rojname, pêlweş û wênegu-  
hêzên neyaran her roj ji derew û gefan têne dagirtin.  
Têkoşer û Pêşmergeyên Kurdistan bi rêbirr, keleş an jî  
ligor parçewelat hevalbendên emperyalîst û şewrewiyan

têne binavkirin!. Çawa ku hebûna gelê Kurd nedihate nas-  
kirin û ew Tirk, Ereb û Faris dihate binavkirin!.

Gelê Kurd yekitîxwaz e, gelê Kurd yekbûna welatê xwe di-  
xwazê. Wî tucaran nexwestiye welatê Tirk, Ereb û Fari-  
san parçe bike! Welatê wî bi destên wan hatiye parçeki-  
rin! Ewana êdî nikarin mînanî caran bi derewkariya cu-  
daxwaziyê ango bi gotinên wan "bölücü" û "înffisalî" ge-  
lê Kurd û gelên aşitîxwaz bixapînin...

Ew derew, gefxwarin, dirindeyî û hovberiya mêtinkaran  
nîşana tirsê wan e, ewana jî çak dizanin ku metirsî ha-  
tiye ser mêtinkarî û karbidestîya wan li Kurdistan. Ev  
tirs ewqas zêde bûye ku karbidestên Turkiyê dikarine ê-  
rişî Kurdistanê Nîvro bikin û bi eşkereyî piştgîriya  
Seddâmê xwûnmij bikin. Di niha de pirsê Musul careke  
din didin ber çavan û jê dibin xwedî.. Ev rewş û doza  
karbidestên Turkiyê metirsîyek mezin dihêne holê û divê  
şoresgerên Kurdistan gellekî bi zîzî li ser vê rewşa nû  
bisekinin û ligor wê jî stratejî û taktîkên xwe biguhê-  
rin û tevgera xwe ya hundirî û derve bajon. Ne dîr e ku  
karbidestîya Îraqê bikaribe bi destên Îranê hilweşe û  
karbidestîyek îranî li cîyê wê were sazîkirin. Ma gelo  
dê şoresgerên Kurd bikaribin xwe li hember êrişêke leş-  
kerên Turk bigre, an dê ewana bi karbidestîya nû re tev-  
kariyê bikin an jî ala serxwebûna Kurdistan di herçar  
parçeyên Kurdistan de bilind bikin û h.d.??

Divê di niha de ev pirsê girîng jî hemû partî û rêxisti-  
nên Kurdistanî were pirsîn û ewana di niha de bicivin  
serhev û hevkarî û tevkeriya xwe pêkbihênin, ger na don-

giya salên 1975 li Kurdistana Nîvro û ya sala 1980 li Turkiyê dê careke din were pêş û keysa ku dikeve destê gelê Kurd bi helaşî biçe.

Li ser van deqan û pirsên ku li Ewropa hene divê ev Komcivîn me jî di van herdu rojan de berhevdanîne dîr û dirêj û havildar bike. Jiber vê emê îsal nameya rêzanî dirêj nekin, piştî pêşkeşkirina nameya karûbar û diravî dê li ser van gişan reya berhevdanê vekin.

Her bijî serxwebûna Kurdistan!

Her bijî Pêşmergeyê Kurdistan!

Gellek spas...

-----

## B I R Y A R Ê N    K O M C I V Î N Ê

KOMCIVÎNA HEFTAN A YEKITIYA DEMOKRATÊN KURDISTAN, RAWESTÎNA BÎSTEKÊ JÎ BO CANGORIYÊN KURDISTAN, DÎ 1.11.1986 DE Li Ratingen/ba Düsseldorf destpêkir û piştî berhevdanîne du rojî belavkirina van biryarên jêrîn pejirand:

A- Komcivîn, "Mafê Çarenûs" a gelê Kurd mafekî xweza û neguhêzbar dizane û dide xûyanîkirin ku sînorên piştî cenga cîhanî ya yekemîn, bi destên emperyalîstan hatine kişandin û Kurdistan kirine çar parçan, gelê Kurd girênade û nayên naskirin..

B- Li Ewropa:

- 1- Divê YDK her li ser têkoşîna xwe ya ji bo nêzîkhev-  
kirin û hevkarîya rêxistinên Kurd li Ewropa domdar-  
be.
- 2- Divê YDK her li ser têkoşîna xwe ya ji bo standina  
mafê
  - a) xwendina kurdî di dibistanên elmanî de
  - b) weşandina kurdî di pêlweş û wêneguhêzên elmanî de
  - c) avakirina şêwringehan ji bo alîkarî û piştgîriya  
malbatên Kurd domdarbe.
- 3- Komcivîn damezrandina Akadêmiya Kurdî pîroz dike û  
bi dilgermî piştgîriya wê dike.
- 4- Komcivîn damezrandina ANK û derketina Kurdistan P.  
dike û serketina wan dixwaze.
- 5- Komcivîn dilxweşiya xwe dide xûyanîkirin ku 18 rêxis-  
tinên Kurd û Nekurd li ser hevkarîya dijî mêtinkarên  
Kurdistan, nemaze dijî êrişên karbidestên Turkiyê ser  
Kurdistana Nîvro gîhan hev û li ser xebata xwe dom-  
dar in.

C- Li Kurdistan:

I- Kurdistana Bakur:

- 1- Komcivîn rêzaniya nijadperest û kemalîst ku bi des-  
tên karbidestên Turkiyê dijî gelê Kurd û hemû rêxis-  
tinên demokrat tête ajotin tawanbar dike û dengê xwe  
bi hişkî dijî van zordarî û hovberîyan bilind dike.  
Komcivîn dide zanîn ku,
  - a) karbidestên Turk di terora mîrî de li gund û baja-  
rên Kurdistan domdar in

- b) bi deh hezaran girtiyên Kurd û Turk di bin zordarî, êşandin û kuştinê de dinalin
- c) ji 2/3 leşkerê Turk di Kurdistanê de cîwar bûye û di bin perdeya "terorîzm" û "cudaxwazî"yê de li ser şoreşger, welatparêz û gelê Kurd terora mîrî bikar dihênê
- ç) nêzîkî 90 hezar leşkerê Turk li ser sînorê Kurdistana Nîvro hatiye civandin.

Komcivîn bi tundî dengê xwe dijî van rastiyên jorîn bilind dike.

2- Komcivîn piştgîriya hemû rengên berxwedana rêzanî û çekdarî dijî vî nîrê çavsor û zînatkar dike û li rêxistinên Kurd û Turk doza hevkarî û pêkanîna eniyeke demokrat û niştimanî dike.

3- Komcivîn dengê xwe dijî alîkariya leşkerî û aborî ku bi destên welatên renga-reng û nemaze yên bi destên NATO tête kirin bilind dike û wan bi hevpariya zînat û zordariyê tawanbar dike.

## II-Kurdistana Rohelat:

Komcivîn bi dilgerrî piştgîriya Şoreşa Kurdistana Rohelat dike û dijî zordariya Komara Îslamî li ser gelê Kurd û gelên li Îranê dengê xwe bilind dike.

Komcivîn doza rawestandina şerê brakuji û pêkanîna eniyeke niştimanî dike.

## III- Kurdistana Nîvro:

Komcivîn bi dil û giyan piştgîriya Şoreşa Kurdistana Nîvro dike û berxwedana eniya "CUD" ku dijî nîrê Seddam ê xwûnwar ala demokratîyê hildaye û şoreşa niştimanî



dajo pîroz dike.

Komcivîn gellekî şa dibe ku şerê brakuji di naybera rêxistinên Kurd de hatiye rawestandin,

Komcivîn linavrakirin û wendakirina 8000 Barzaniyan û herwaha ji Îraqê derxistina deh hezaran Kurdên Feylî tawanbariyek mezin dibîne û dengê xwe bi hişkî dijî van hovberiyên dijmeroyî yê karbidestên Îraqê bilind dike.

IV- Kurdistana Navîn:

Komcivîn dûzanên taybetî yê wek ji hemwelatiyê bêparhiştin, guhartina nayên kurdî û "kembera erebî" ku dijî gelê Kurd li Suriyê hene tawanbar dike û linavrakirina wan pêwîst dibîne.

Komcivîn li karbidestên Suriyê naskirina mafên gelê Kurd doz dike.

Komcivîn dengê xwe dijî karbidestên Suriyê bilind dike ku îsal kelem xistin pêsiya pîrozkirina cejna Newrozê û ku hûn ûştta kûştina besdarekî.

Ç- Li Rohelata Navîn:

Komcivîn ne bawer e ku bê naskirina mafên gelê Kurd demokratî û aşitî bikaribe di Rohelata Navîn de cîwar bibe.

Komcivîn diltengiya xwe dijî şerê di navbera Îran û Îraq de dide xûyanîkirin û dengê xwe dijî bombebaranîkirina herdu parçeyên Kurdistan bilind dike.

Komcivîn dide xûyanîkirin ku alîkariya çekan ji bo herdu şerxwazan dibe ûştta domkirina vî şerê xwûnrêj û van welatên alîkar tawanbar dike.

Komcivîn dengê xwe dijî hemû karbidestên rêxistinên li Lûbnanê bilind dike ku rê li ber Kurdan teng dike û ji bo berjewendiyên xwe bikardihênin.

Komcivîn li welatên rojava doz dike ku xwesparteyên (laci'i,mûltecî) Kurdên Suriyê û Lûbnanê jî wek Kurdên din nasbikin û cudabûnê nekin navbera Kurdan.

D- Navnetewî:

- 1- Komcivîn piştgîriya têkoşîna gelên Asya, Efrîka û Emerîkaya Latîni dijî mêtinkarî û emperyalîzmê jibo serxwebûn, pêşketin û dadîmendiya civakî dike.
- 2- Komcivîn nîrê Efrîkaya Nîvro tawanbar dike ku her rêzaniya rengparêzî û nijadperestiyê dijî reşikan dajo.
- 3- Komcivîn pêşniyarên Sovyet jibo kêmkirina çekên atomî keyseke baş dibîne û doz li karbidestên NATO, ne-maze yê Emerîkaya Bakurî dike ku dev ji şerê ezmanî berdin û vê keysa bê hempa jibo jiyana merovî û aşitiya cîhanê bikarbihênin.
- 4- Komcivîn doz li hemû rêxistinên navnetewî dike ku pirsiyariya gelê Kurd têxin nav bernamecên civînên xwe û gelê Kurd û mafên wî yê "Çarenûsî" nasbikin.

Ratingen,roja 2.11.86

---

Ey biryarana dê bi zimanên Erebfî, Tirkî û Elamî jî werin belavkirin.

---

## HÎN NAMEYÊN XWENDEVANAN

Hevalên xoşewîst,

li binê dunê û bi hezaran kîlometir ji welêt dûr, va ye di nivê şevê nîsanê de min xwendina biryarên komcivîna we ya şeşan kuta kir û pêşî xistiye dest bo we di derheqê van biryaran de ji dil pîroz bikim. Ez dizanim komcivîna we ber heft mehan cîh girtiye, lê wek bapîrên me digotin: "bila avis be, bila dereng be". Bi rastî bîborin, min tiştê weqas pirr li ser rêxistina we nedizani. Bi reya kek Hemreş, sad baş bû ku hin matîryalên rêxistina we gihêştin min.

Çiqa bêhna yekî fireh dibe, dema ew tiştên di cîh de dixwîne, di şûna ku rûpelên tijî peyvên bê mane û hezar carî hatî ducar kirin. Biryarên komcivîna we bi niştîmanperwerî û welatparêziyê digirtî ne û heviyê didin yekî, ku belkî rojekê em jî bikaribin wek neteweyekî têkoşîna rizgariya welatê xwe di bin alekê de pêşve bibin. Bo vê kêfxweşiyê min xwest, wek Kurdek li xeribiyê, ji we re spas bikim û we bo reya rast pîroz bikim.

Tev silavên biratîyê.

Şahîne B. Soreklî  
Sydney, 26.04. 1986

---

KOMELA KORDÊ AUSTRALIA

AUSTRALIAN KURDISH ASSOCIATION

P.O.Box 407, Bankstown, N.S.W. 2200, Australia

Sydney, 17.08.1986

Brayê hêja Hemreş Reşo,

Nameya te û deh (10) heb ji kovara Yekitiya Demokratên Kurdistan (Prof. Qanatê Kurdo) gihêştin destên me, ji bo wan zor spas.

Em pîrr kêfxweş in bi xebata we û bi dengê we û nivîsarên wê yên giring ji bo gelê me. Ev rêça hûn li ser, rêça her merovekî Kurd ê têgihêstî ye. Rêça hûn li ser û rêça me wekhev in û hêviya me ew e ku ev rêça bibe ya her merovekî Kurd ê ku rewşa birîna gelê xwe di kûranî de fêm kiribe. Em bi her hawayî bi xebata we re ne û hêviya me ku ev xebata ji bona yekitî û pêşveçûna dengê gelê me hertim pêşve here û Kurdayatî bibe armanca me ya yekemîn.

Em silavên brayetî û kurdayetiyê ji bo we pêşkes dikin. Serfirazî û serketinê her tim ji bo we daxwaz dikin.

Brayê te  
Mistefa Xelîl

---

## DER RICHTER UND DER KURDISCHE BAUER

"Ich fragte, ob du Türkisch sprichst", fragte der Richter.

"Sehr wenig", antwortete der Bauer lächelnd und sehr höflich,

"sehr wenig Euer Gnade".

"Sprichst du vielleicht Arabisch?" fragte der Richter.

"Nur für's Beten benütze ich paar Zeilen, die ich nicht verstehe, Euer Gnade. Ich bin ja kein Mullah", antwortete der Bauer.

"Dann mußt du Persisch reden", schrie der Richter.

"Nein, tut mir leid", antwortete der Bauer, "Persisch habe ich nie gelernt."

Der Richter, der die Geduld zu verlieren schien, fragte, ob er Englische, Deutsch oder Farnzösisch sprach! Als der Bauer lächelnd verneinte und hinzu fügte, daß er in den Bergen nie die Gelegenheit gehabt hatte, eine dieser Sprachen zu lernen, brüllte der Richter und befahl, daß man "diesen Idioten" hinaus schmeißen solle.

Nach dem man ihm ins Gesicht schrie, auf ihn fluchte und ihm ein Stück Papier in die Hand schob, auf dem das Datum der nächsten Verhörung geschrieben worden war, fand sich der Bauer auf der stäubigen Straße der kleinen Stadt und fragte sich wiederholend: "warum hat er mich nicht gefragt, ob ich Kurdisch spräche??"

"Dafür muß man kämpfen, Onkel", sagte ein junger Mann, der ihn überhörte.

"Wieso kämpfen", fragte der Bauer erstaunt, "wir sind alle Muselmanen, wie Brüder sollten wir miteinander leben".

"Es ist eine Brüderlichkeit mit einer Richtung, lieber Onkel", sagte der junge Mann, "hast du das in allen diesen Jahren nicht bemerkt?"

"Doch, ich glaube du hast Recht mein Sohn", sagte der alte Bauer leise, und als er zu gehen anfang, hob er seine beiden Hände nach oben, als ob er betete und murmelnd sagte er ganz traurig, doch mit zorn:

"warum haben sie so viel Angst vor unserer Sprache, lieber Gott, warum haben sie so viel Angst vor unserer Sprache, daß wir sie nicht mal im Gericht benützen dürfen?!"

Auf dem schmutzigen Marktplatz hörte man einen Gendarmen, der einen Jungen ins Gesicht schlug, brüllend: "du Eselsohn, wie oft hab' ich dir gesagt du sollst Türkisch reden! Sei doch stolz, daß man den Hunden wie dir erlaubt Türken zu sein!!"

Schahin Baker

---

---

## WEIT WEG VON KURDISTAN---

Leer ist die Welt und weit-weit weg von Kurdistan  
Leer ist mein Herz, so leer und ganz allein  
Sonne und Mond, sie schau'n-schau'n mich so traurig an  
Ich muß zurück, zurück nach Kurdistan.

Wolken und Wind zieh'n hin- zu meinen Freunden hin  
Tränen und Schmerz zieh'n mit zu ihnen hin.

Berge und Wald sind wild, sind wild in Kurdistan  
Täler und Seen sind tief, so tief und rein  
Trauer und Leid sind groß, wann fängt die Freiheit an  
Ich muß zurück, zurück nach Kurdistan.

Wolken und Wind zieh'n hin- zu meinen Freunden hin  
Tränen und Schmerz zieh'n mit zu ihnen hin.

Leer ist die Welt und weit-weit weg von Kurdistan  
Ich muß zurück - zurück nach Kurdistan

Männer und Frau'n sind treu, sind treu in Kurdistan  
Freude und Glück sind stoltz, so stoltz und frei  
Hart ist der Weg und lang, wann fängt der Friede an  
Ich muß zurück - zurück nach Kurdistan.

Kommen wir einst zurück, zurück nach Kurdistan  
Tanzen wir froh, voll Glück, dann sind wir daheim  
Blumen erblüh'n bei uns, jetzt fängt das Leben an  
Wir sind zurück, zurück in Kurdistan

Wolken und Wind zieh'n hin, zu unseren Freunden hin  
Freude und Glück zieh'n mit zu ihnen hin  
Reich ist die Welt bei uns, bei uns in Kurdistan  
Wir sind zurück.- zurück in Kurdistan. Rizgar Heval

BRIEF DES REVOLUTIONSFÜHRERS OBERST MUJAMMER AL GADDAFI  
an den türkischen Ministerpräsidenten zum türkischen  
Luftangriff gegen die Kurden im Irak

Die Aktion der türkischen Luftwaffe mit dem Ziel, kurdische Bürger auf irakischem Boden zu töten und sie zu vertreiben, ist eine Tat, die wir entschieden ablehnen. Sie ist von allen Völkern zu verurteilen, weil sie eine Art von Völkermord darstellt. Diese Aktion hat außerdem die Zerstörung von Häusern und Dörfern sowie die Tötung von Kindern und Frauen zur Folge gehabt, was den Praktiken des Zionismus zur Ausrottung des arabischen Volkes und denen des Apartheidregimes zur Ausrottung der afrikanischen Bevölkerung in Südafrika gleicht.

Die Kurden sind zum einen Mitglieder der nationalen Führung der revolutionären Kräfte, und außerdem muß man sie als Nation achten, die ein Recht auf Einheit und Unabhängigkeit hat. Sie ist eine der türkischen, der arabischen und der iranischen verwandte Nation. Das Verleugnen ihres Rechtes auf nationale Identität nimmt auch uns das Recht, unsere eigene Freiheit zu verteidigen.

Ich war sehr erzürnt über diese Tat, von der ich hoffe, daß sie sich nicht wiederholen wird.

Wenn es sich aber um gewöhnliche individuelle kriminelle Taten handelt, so ist diese Methode nicht die geeignete Antwort darauf. Ich bedauere es, daß sich die türkische Regierung in eine Verschwörung mit der irakischen Regierung verstrickt hat mit dem Ziel, eine Strafaktion gegen unsere kurdischen Brüder zu unternehmen.

Es ist dies eine beschämende und beispiellose Verschwörung von Seiten der irakischen Regierung.



## PRESSEERKLÄRUNG

Nachrichten aus Kurdistan versichern, daß die türkische Armee einmal mehr in den frühen Morgenstunden des 27.02. in den nördlichen Teil des irakischen Kurdistan eingedrungen ist, wo kurdische Guerillas und die Bevölkerung Widerstand leisten. Nach türkischen Pressemeldungen (Hürriyet v. 28. Februar 1987) will die türkische Armee " so lange wie notwendig" in Irakisch-Kurdistan bleiben. Diese Meldungen wurden auch am 4.03.87 durch deutsche- und ausländische Medien bestätigt. So, nach ARD sollen 30 Kampfflugzeuge am 4.03.87 mehrere Ortschaften in Irakisch-Kurdistan bombardiert und mehr als Hundert Tote und Verwundete verursacht haben.

Außerdem hat die Regierung in Ankara unter dem Vorwand der Aufforstung und Waldpflege einen Plan gefaßt zur großangelegten Massendeportation der ländlichen Bevölkerung von Türkisch-Kurdistan in die West-Türkei und der Ansiedlung von Millionen von Türken in Kurdistan.

Laut dem türkischen Minister für Landwirtschaft Hüsni Dogan (zitiert von Hürriyet v. 19.02.87) wird die Deportation "Freiwillig" sein und soll auf lange Sicht insgesamt 9 Millionen Menschen umfassen, von denen schon 3,5 Millionen entsprechende Vorzubereitungen zum Verlassen ihres Landes und ihre Dörfer zu treffen.

In den letzten wenigen Monaten sind tatsächlich 100.000 Kurden mit Gewalt aus dem Gebiet von Dersim (Tunceli) de-

portiert worden und einige 50.000 Türken in Urfa und Umgebung (Kurdistan) angesiedelt worden.

Wir appellieren an das Weltgewissen gegen diesen Akt des Völkermordes und der Barbarei zu protestieren. Zusammen mit anderen kurdischen patriotischen Parteien und Kräften aus allen Teilen Kurdistans werden wir Maßnahmen ergreifen, um den kurdischen Volkswiderstand zu stärken mit dem Ziele der nationalen Befreiung und kulturellen Überlebens.

6.März 1987

|        |   |
|--------|---|
| KD     | (Revolutionäre aus Kurdistan)                           |
| PDK-RN | (Demokratische Partei Kurdistan-Nationale Organisation) |
| PGK    | (Volkspartei Kurdistan)                                 |
| PPKK   | (Avantgardistische Arbeiterpartei Kurdistan)            |
| YSK    | (Einheit der Sozialisten Kurdistans)                    |

---